

Komîteya Emrîkî ya Azadiya Olan a Navneteweyî hêzeke serbixwe û cudayî Wezaretê Karên derve ye, ev komîte ji aliyê Kongresa Emrîkî ve hatiye damezirandin, ew desteyeke şewirmendiyê ya hikûmetê ye û serbixwe ye, ji aliyê herdu partiyên demokrat û komarîst ve tîn piştgirîkirin, erka wê ew e ku çavdêriya azadiya olan li ser astê cîhanê bike, wesayetên siyasî yên vê desteyê girêdayî Serok, Wezîrê karên derve û Kongresê ve ne. komîte van wesayetan (daxwazname) ji wîlayetên me yên zagonî û li gorî pîvanên Rêxistina Navneteweyî ya Mafên Mirovan û hinek belgeyên din wergirtine. Ev rapora salane bi taybet jî ya sala 2015 an weke serkeftinekê ye ku nûner û karmendên pispor ji destpêka vê salê li ser xebitîne ye, ji bo ku bikaribin kiryarên li dijê xakê hatine kirin belge bikin û daxwaznameyên serbixwe yên hikûmeta Emerîkayê amade bike. Rapora 2015 an ji 31 Yinayrê 2014 heta bi 31 Yinayir 2015 digire nava xwe, tevî ku hinek dosya û bûyerên ku di çarçoveya zemanî ya vê raporê de derbas bûbin jî.

Sûriya:

Encamên sereke:

Pêkhatayên olî li Sûriyayê bi giştî ji mafê azadiya olî bêpar mane, her wiha cihêrengiya dîrokî li gel wê hema mirov dikare bêje ku tune bûye. Piştî çar salan ji pevçûnê, êdî cihêrengiya olî û azadiya wê qurbaniya kiryarên Esed in her wiha çekdarên muxalefeta ku li ser astê navneteweyî bi fermî tê pejirandin û dîsa jî komên ku ji aliyê Emerîkayê ve li ser lîsteya terorê ne jî û bi taybet Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê DAIŞ jî hevkarên Esed di vê sûcî de ne. aloziya Sûriyayê bipêş ket heta ku bû şerekî etnîkî û çarçoveya wê berfireh bû. Ji ber ku rêjîma Esed bi awakî sistematîk û rêbazane dest bi koomkijiyên û serjêkirinan kir û di serî de li dijî mislimanên Sune, vê yekê rê li ber DAIŞ vekir ku bi awakî berfireh xwe di anva wan de bicih bike, vê pêşketinê herêma me bi tevahî da ber tehdîdê,

her wiha hemû pêkhatayên me yê olî yê ku îdolojiya olî ya radîkal napejirînin û pêkhatayên biçûk ên ku hene êdî li ber gefa jiholêrabûnê ne. heta niha jî rêjîma Esed sivîl û mislimanên Sune û kes û komên din ên ku li dijî rêjîmê ne hedef digire, bi taybet jî cihên ku sivîl lê hene bê cudahî bombebaran dike. Her wiha rêxistina DAIŞ jî bi heman kiryanan rêjîmê, alîgirên wê û pêkhatayên olî yê din û hemû mislimanên ku li dijî îdolojiya wî ya zordar disekine, hedef digire. Nîvê miletê Sûriyayê yê ku berî destpêkirina aloziyê li Sûriyayê bûn, niha koçî derve kirine û li welatên cîran bicih bûne yan jî di hundur Sûriyayê bi xwe de bûne penaber. Her wiha niha nayê zanîn ka hejmara pêkhatayên olî yê biçûk çiqas in ku niha li Sûriyayê dijîn, ji ber ku Sûriyayê berê cihêrengiyek olî di nava xwe de dihewand. Û ji ber kiryarên ku rêjîma Esed û aliyên din ên li ser erdê hene dikin, komîteya emrîkî ya azadiyên olî ya navneteweyî di rapora xwe ya 2015an û di sala xwe ya duyemîn de daxwaz dike ku Sûriya wek (Welatê ku bi awakî mezin balê dikişîne) were cudakirin.

Piştperde:

Pevçûnên Sûriyayê ku di sala 2011an bi daxwazên aşîtiyane ji aliyê rikberên rêjîma Esed ve hat destpêkirin, piraniya van rikberan mislimanên Sunî bûn, lê belê di nav wan de bi hejmarek kêr ji olên din jî hebûn. Çalakiyên destpêkê tu rengê xwe yê olî yan jî etnîkî wernegirtibû lê belê daxwazên herî sereke rakirina zagona awarte ya zordar bû, vekirina derfetan ji partiyên siyasî re, û rakirina Esed ji ser kursiyê. Bi mezinbûna çalakyên re, Esed fermana çewisandinek zordar da, Esed bi rêjîma xwe re li ser werîsê metirsiya etnîkî list û xîtabeke oldarî balkêş bikar anî ku pê perçekirin da çêkirin. Her wiha komên berê li ser lîsteya terorê ya emrîkayê mîna Hizi Ellah û Şebîha ve piştgiriya Esed kirin. Li aliyê din jî li dijberê Esed bi sedan ji komên herêmî û navneteweyî rawestiyên û her yekî hinek armancên xwe ji vê yekê hebûn. hinek alî hene, mîna Itîlafa Niştimanî ya Şoreşa Sûrî û hêzên muxalefetê (bi navê Itîlaf Wetenî Sûrî tê naskirin) rêbazê çareseriya demokratîk ji xwe re esas digire, hinek aliyan din jî mîna DAIŞ hene bi îdolojiyên olî yê radîkal tev digerin.

Ev pevçûn derbasî sala xwe ya pêncemîn dibe, û heta asteke mezin jî bûye şerekî etnîkî, mislimanên Sunî heta radeyekê bi giştî li gel Elewîyan di nava

peywendiyên de ne, her wiha mislimanên Şîa alîgirên Esed in, her wiha Elewî jî wisa ne, gelek ji Ewewiyânû mislimanên Şîa û mesîhiyan û gelekên din guman dikin ku eger rêjîma Esed bikeve dê ji aliyê DAIŞ û komên îslamî yên sunî radîkal ve werin kuştin.

Berî vê şerî serhejmariya welatîyên Sûriyayê 22.5 milyon kes bûn, mislimanên Sunî %74 û mislimanên din jî weke Elewîyan, Îsmâîliyan û mislimanên Şîa %13 bûn û Diroz %3 û pêkhatayên mesîhî jî ku di nav xwe de pêkhatayên Suryanî, mesîhî, Yûnanî. Ertodoks dihwîne %10 bûn.

Rewşên azadiyên olî 2014 - 2015

Pinpêkirinên ji aliyê rêjîma Esed û komên girêdayî wê: Rêjîmê hovîtiya xwe bê cudayî li dijî hemûyan meşand. Di serî de pêkhateya muslimên Sunnî û cihên niştecibûna wan hedef girtin. Rêjîmê atmosfêrek çêkir û hebûna mafên mirovan ên ji aliyên navnetewî ve hatine parastin, nemaze azadiya baweriyên tede nedihatî dîtî. Netewên Yekbûyî û piraniya civaka navnetewî û di nava wan de Emerîka dîtî ku rêjîma Esed li dijî mirovahiyê sûc kiriye. Rêjîmê û alîgirên xwe li gel komên terorîst tektîkên kuştinê yên derveyî çarçoveya Dadgeriyê pêk anîn. Her wiha kiryarên wekî destdirêjî, îşkence, bikaranîna çekên kîmyawî, topbarana deverên sivîl, nemaze mizgeft û dêran kirin û ji bo desthilatdariya xwe biparêze nan û alîkarî jî birîn.

Pinpêkirinên ji aliyê Rêxistina DAIŞ'ê û komên din ên radîkal û yên terorîst: Di Sûriyeyê de Rêxistina DAIŞ, El-Qaîdê Xurasan, Cebhet El-Nusra û gelek komên din ên radîkal û gelek kesên tundraw ên ji seranserî cîhanê li hemberî rêjîmê yan jî ji bo belavkirina bîrdoziya xwe ya olî ya radîkal şer dikin. Îlankirina "Dewleta Îslamî" ji aliyê Rêxistina DAIŞ'ê ve di Hizêrana 2014'an de ku ji Sûriyeyê û Îraqê pêk tê, li hemberî mafên mirovan û azadiyên baweriyên mijarekî xemgîniyê ye. Rêxistina DAIŞ'ê rêbaza tundiyê digire dest û tu derfetan nade cudahiyên olî û baweriyên û baweriyên olî ku bi sedan salan di Sûriyeyê de jîyan dikirin, hedef girtin. Her wiha mislimanên ku nêrîna wan qebûl nekirine jî hedef girtin. Rêxistina DAIŞ'ê cudahiyên ol û baweriyên di welat de parçe kirin. Êrîşên DAIŞ'ê yên herî hov ên wekî serjêkirin û komkujiyan gelekî belav bûye û baş hatiye belgekirin. Li gel vê yekê jî Rêxistina DAIŞ'ê û komên

din ku dagirkeriya parçeyên girîng ji Sûriyeyê dikin, sîstemên wekî sîstema desthilatdar in, nemaze avakirina Dadgehên Olî ku hemû mafên mirovan li deverên serweriya wan binpê dikin.

Komên opozîsyonê: Di salekê de ji amadekirina raporê, Koalîsyona Niştimanî ya Sûriyeyê bi awayekî çalak û têr nûnertiya baweriyên olî ne kir. Siyaseta hundirîn, hêza vê koalîsyonê ji bo karibe deriyê diyalogê bi rêjîma Esed re vebike yan jî veneke, asteng kir. Di vê sala dawî de raporên derbarê Artêşa Azad de derketin holê, di van raporên de diyar dibe ku Artêşa Azad li dijî mafên mirovan kiryarên hovane pêk anîne. Her wiha komkujî li dijî muslimanên Şîî pêkanîne. Tevî vê yekê jî yekîneyên leşkerî yên opozîsyonê ji bo ku herêmên stratîjîk biparêzin li gel komên terorîst xebitîn. Vê yekê hişt ku civaka navnetewî nîkaribe Sunniyên radîkal ên beşdarî Rêxistina DAIŞ'ê bûne û yên ku ji aliyê Emrîka ve wekî komên terorîst hatine diyarkirin û muslimanên din ên Sunnî ku li hemberî rêjîma Esed têdikoşin, ji ve derbixe.

Koçber, belavbûna şerê navxweyî, koçberên hundir: Dirêjbûna şerê desthilatdariyê û bilindbûna hejmara koçberan li dewletên cîran, bû sedema rewşên mezhebî û metirsiya tundiya mezhebî û bê aramî li van dewletan zêde kir. Piraniya koçberên Sûriyeyê li şûna kampên koçberan ên fermî, li herêmên bajarî û gundewaran bi cih bûne. Ji ber vê yekê barekî giran li ser aboriyên van dewletan û binesaziya wan çêbû. Li aliyekî din koçber rastî gelek astengiyên civakî tîn ji ber ku li wan dinêrin ku ew hatine karên wan ji dest wan girtine û berhemên wan bi kar tînin.

Aloziya Sûriyeyê ji nîva meha çileyê 2015'an ve bû sedema koçberiya 3.3 milyon kesan, li gorî Netewên Yekbûyî piraniya wan li Lubnan, Urdun, Tîrkiye, Îraq û Misrê hatine qeydkirin. Guman e ku bi sedhezran ji bilî van ên nehatine qeydkirin li van welatan hene. Bêtirî 3/4 ji koçberan ku li ba Netewên Yekbûyî hatine qeydkirin, jin û zarok in. Bi dehhezaran zarok ji ber ku di dewletên koçberiyê de nasname ji wan re dernakeve, bê nasname hatin dunyayê. Tevî vê yekê jî gelek koçberên ku li Îraqê bi cih bûne, dîsa rastî rewşên metirsîdar ji ber şerê li vir hatin. Nêzî 9.3 milyon welatîyên sûriyeyê pêdiviya wan bi alîkariyên sereke yên wekî xwarin, ava bicihbûn hene. Her wiha 6.5 milyon welatîyên din di hundirê Sûriyeyê de koçber bûne.

Siyaseta Emrîka

Ev demeke dirêj e têkliyên di navbera Emrîka û Sûriyeyê de dijminahî ye. Di dema rêjîmên Hafîz El-Esed û kurê wî Beşar El-Esed, Sûriye di lîsteya dewletên alîkarên terorê ya Emrîka de ji sala 1979'an de cih digire. Ji destpêkirina destwerdana leşkerî ya Emrîka di Îraqê de di sala 2003'an de dijminahiya di navbera herdu dewletan de zêdetir bû. Rêjîmê Esed nikaribû rê li pêşiya çekdarên biyanî ku derbasî Îraqê dibûn bigire. nerazîbûna rêjîma Esed ji bo derxistina îraqiyên di Sûriyeyê de yê ku alîkariya şerê li dijî Emrîka dikirin. Berdewama hewldana wergirtina çekên komkujî ku yek ji metirsiyên Emrîka bû. Ji ber van sedeam Emrîka cezayên aborî li gorî qanûna cezakirina Sûriyeyê ku derbaskirina berhemên Emrîka ji Sûriyeyê re qedexe ye, danîn ser Sûriyeyê. Di sala 2008'an de jî xizmetên Emrîka jî ji bo Sûriyeyê jî hatin qedexekirin.

Tundiya rêjîmê li hemberî vê yekê li dijî xwepêşandanên aştiyane yê di sala 2011'an de, hişt ku Emrîka cezayên din li dijî Sûriyeyê derbixe û hin kom û kesên ku mafên mirovan binpê kirine û alîgirên rêjîma Esed ceza kirin. Di sala 2012'an de Emrîka sefaretê xwe ya li Şamê girt. Di adara 2014'an de sefaretê balyozxaneyên Sûriyeyê yê li Emrîka girtin. Ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve Emrîka banga bi alîkirina rêjîma Esed dike. Emrîka her wiha koalîsyona Niştimanî ya Sûriyeyê (ku berê bi navê Koalîsyona opozîsyona Sûriyeyê dihat naskirin) wekî nûnerê rewa yê gelê Sûriyeyê nas kir. Her wiha buroyên wê fermî li Washington û New York wekî şandeyên dîplomasî vekirin. Lê wekî hikûmeteke fermî ji bo Sûriyeyê hêjî nas nekiriye.

Rola Emrîka di avakirina koma Dostên Sûriyeyê de girîng bû. Ew jî komek ji dewlet û rêxistinên pêk tên û bi awayekî asayî li derveyî Konseya Ewlekariyê ya navnetewî ji bo nîqşakirina aloziya Sûriyeyê civiyan. Ev kom piştî ku Rûsiya û Çîn Veto li dijî gelek biryarên Konseya Ewlekariyê yê ku dibe ku rêjîma Esed sûcdar derbixe bikar anîn, hate avakirin. Ev kom di salên 2012 – 2013'an de 4 caran li hev civiyan. Di vê dema dawî de jî Rûsiya û Çînê ji bo Konseya Ewlekariyê dosya Sûriyeyê hewaleyî Dadgeha Navnetewî bike, bûn asteng. Emrîka jî ji bo şerê li dijî Rêxistina DAIŞ'ê di avakirina koalîsyoneke navnetewî ku ji 60 dewletan pêk tê, bi roleke sereke rabû. Emrîka û endamên koalîsyonê li dijî herêmên di bin dagirkeriya rêxistina DAIŞ'ê yê Sûriyeyê de ne, êrîşên ezmanî pêk anîn. Li gel vê yekê jî Emrîka alîkariyên ne leşkerî û hin çekên sivik

bi komên li dijî Rêxistina DAIŞ'ê re yên di Sûriyeyê de kir. Di çileyê 2015'an de Pentagon ragihand ku bi sedan leşkerên Artêşa Emrîka yên pispor di perwerdeyên leşkerî de ji bo perwerdekirin û amadekirina Sûriyan hatine erkdarkirin.

Li gorî lêkolînên Congress a meha sibatê, li hemberî alîkariyên mirovahî ji bo aloziya Sûriyeyê, herî zêde Emrîka bû bersiv. Emrîka di navbera îlûna 2012'an heta kanûna 2014'an de 3 milyar dolar ji bo alîkariya mirovahî ya aloziya Sûriyeyê veqetandin. Her wiha ji destpêka sala 2015'an ve li gorî aloziya Sûriyeyê, Emrîka hejmarekî hindik (450 kes) ji welatîyên Sûriyeyê li Emrîka bi cih kirin. Li gorî Cîgira Wezîrê karên Derve yê karûbarên niştecihbûn, koçber û penaberan Anrichard ragihand ku dibe Emrîka di sala 2015'an de bêtir koçberên Sûriyeyê li Emrîka bi cih bike. Li gorî Ajansa Reuters'ê ragihand ku berpirsyarekî Wezareta Karên Derve ya Emrîka diyar kiriye ku dê di sala 2015'an de hezar heta 2 hezar koçberên Sûriyeyê derbasî Emrîka bikin.

Daxwaz

Hemû welatîyên Sûriyeyê, nemaze muslimanên Sunnî, Şîî, Elewî, Xiristiyan û hemû mezhebên din ên wekî Êzdî, Diroz ku di rewşên dijwar re derbas dibin û rastî pêşerojê reş tî, jiyana dikin. Avakirina dewleta Sûriyeyê piştî şerê desthilatdariyê, cudahiya baweriyên û mafên kêmtewan û azadiya olî û baweriyên bi nifşekî temam re tê pişaftin û li hemberî şer, piçîbûna demdirêj, nexweşî, xizanî û xapandina li pey bîrdoziyên radîkal rû bi rû ye. Komîteya Azadiyên Ol û Baweriyên Navnetewî ya Emrîka banga bi dawîkirina şerê desthilatdariyê dike û ji hikûmeta Emrîka dixwaze ku Sûriyeyê wekî dewleteke balkêşîya taybet bi nav bike. Divê hikûmeta Emrîka van xalên jêrîn pêk bîne:

- Garantiya dayîna azadiya olî cihêrengiya olî weke sereke xaên pilana dîplomasî were destnîşnakirin ku dixwazin bi vê yekê bigihînin çareseriyek siyasî ji van pevçûnan re.
- Di civînên xwe de hişiyarkirina koalîsyona navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê û piştgiriya wê ji bo pêşxistina rêbazên parastin û alîkariya hindikahiyên olî û etnîkî li herêma, ji ber wê yekê pêwîstî bi piştgiriya mirvoahî lezgîn heye, her wiha ji nûve sererastkiriin û birêkûpêk-kirina bicihkirina hindikahiyên herî

lewaz û bê derfet li welatekî sêyemîn, her wiha divê ku piştgiriyeke dimdirêj ji welatên ku mêvandariya van kesên ku dixwazin bi dawîbna vê şerî re vegerin welatê xwe were kirin.

- Divê ku garasntiya wê yekê were kirin ku Emerîka pilana Sûriyayê ya piştî şer dike (ku hikumet bi temam be) û divê ku dosyayên girêdayî azadiyên olî û yên girêdayî mafên microvan li ser werin sekinandin, her wiha komîteya Emrîkî ya azadiya olan a navneteweyî û rêxistinên pispor di miajra van dosyayan de di hikuemta emerîkayê de şîret û şêwirmendiya guncaw bidin.
- Piştgiriya koalisyona niştimanç ya sûrî ji bo ku hemû komên olî û etnîkî bigire nava xwe û endamên wê li ser pîvanên navneteweyî yên mafên microvan û yên olî werin perwerdekirin.
- Amadekirina daxwaznameyekê ji aliyê konseya ewlekariyê ya dadgaha cînayetkarî ya navneteweyî ve ji bo vekirina lêpîrsînê di derbarê kiryarên DAIŞ li Iraq û Sûriyayê ku li dijî hindikahiyên olî û etnîkî pêk anîne, her wiha destpêkirina lêpîrsînê ji aliyê dadgaha cînayetkariyê ve di derbarê sûcên ku ji aliyê rêjîma Esed ve pêk hatine wek çawa ku li sûdan û Lîbyayê nimûneyên wê derketine pêş.
- Hevkarî di navbera ajansên navneteweyî yên pisporî û rêxistinên derveyî hikumetan û kes û fabrîkeyên di nava koalisyona navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê cih digrin hevkarî pêk were ji bo ku rê li ber piştgiriya lojistîkî ya DAIŞ`ê bigirin û li şûna wê bernameyên lêborîna olan bipêş bixînin û astên tevliheviya etnîkî daxînin, li şûna wê rêzdariya di navbera azadiya olan de were pêşxistin û mafên wan li welatên ku lê penaber bûne de weke (lubnan, tirkiye, misir, urdun) were kirin, her wiha amadekariya piştî bidawîbûna şerê li sûriyayê jî were kirin.
- Zêdekirina pêşwaziya emerîkayê ji penaberan re ji 70, 000 bibe 100, 000 herî kêr, her wiha hinek amadekariyên zêdetir jî ji bo herêma rojhilata navîn werin pêşxistin.

- Deristina lêborînekê ji bo penaberên sûrî yên ku piştgiriya komên çekdar yên ku emerîka piştgiriya wan dikir yan jî kesên ku piştgiriya rêxistinên terrorist di bin zordariya hêzê yan jî ji ber tirsê de kirin, her wiha zagona madî ya ku di zagona penaberiye ya emerîkayê de heye were bikaranîn, her wiha ev zagon bi awakî rast û durust were bikaranîn ji bo ku bernameya emerîkayê ya ji bo penaberên sûrî şaş neyê bikaranîn, tenê ji bo kesên ku li ser emerîka xeter nayên dîtin û kesên ji ber ku rêjîma esed û komên terrorist reviyane were derxistin.
- Cudakirina pareke guncaw û têrker ji bo wezaretê ewlekariya hundurîn û ji bo saziyên din ji bo ku daxwazname bi awakî lezgîn werin pêk anîn û her wiha lêpîrsîna ewlekarî ji bo kesên ku daxwaznameyan pêşkeş dikin were kirin ji bo ku penaberên sûrî bi awakî hêsan li emerîkayê werin bicihkirin bê ku ti xeterî bigihîne ewlekariya neteweyî ya emerîkayê.
- Berdewamiya piştgiriya lojistî ya Neteweyên yekbûyî û rêxistinên mirovahî û civakên ku pêşwaziya penaberan kirine bi taybet lubnan û urdun û misir û tirkiyeyê ve ji bo penaberên sûrî, her wiha piştgiriya ji bo penaberên li hundur jî berdewam dike ji bo ku bibe nimûneyek ji welatên din re.